XEBAT XEBAT XEBAT

ŞEŞ SAET XEBAT

JI BO HEMÎKESÎ KAR Û XEBAT

Bila herkes 6 saetan bixebitin,
kesek bila bêkar nemîne!

GELÎ CIWANAN, ESNAFÊN BIÇÛK, BÊKARAN, JINÊN KEDKAR, KARKERNO!

Kêlên aboriyê êdî hev nagrin!

Li Tirkiyê qeyrana aborî berî niha jî hebû, lê bi belavbûna Koronayê re girantir bû û hêja jî dibe! Desthilatdarî, di vê qeyrana ku ji aliyê deynên carî ve bêtir xedar dibe, ewil ji bo pişkinîna kûrên diwîzan di nav bêbiryariya bilindkirina rêjeya faîzê û bikaranîna rezervên Banqa Navendî (BN) de ma. Wan riya duem hilbijart. Ango di sala 2020î de, faîzê di rêjeyek kêm de hiştin û ji bo kontrola diwîzê jî firotina diwîzên wê rezervê ceribandin. Jixwe Erdogan jî bi gotina "rezervên diwîzan ji bo milmilaneya kûr were sekinandin hatin bikaranîn", vê yekê qebûl kir û bi vî awayî bersiva pirsa "128 milyar dolarên di qaseya BN de bi kuderê ve çû?" da. Lê bes, ev jî nebû derman, BN rêjeya faîzê 8. 25 ji % ewil bir 17 ji %, piştre jî gihand asta 19 ji %. Bi vî awayî Tirkiyê ket nava 10 welatên ku faîza wan herî zêde ye. Di encam de, li aliyekî ve rezervên BN hatin xerckirin li alî din rêjeya faîzê hat bilindkirin. BN ya ku sala 2020an bi 41 milyarên kêmek rezervên xwe girt, tê gotin ku hêj di destpêka sala 2021ê de rezervên wê yên kêmek bi ser "60 milyar dolaran" ketiye.

Ji devlê hilberînê polîtîkaya faîzê û pereyê neqdî! Mîna mirov hewl bide yekî esrarkêş bi morfînê rihet bike!

Piştî ku faîz bilind bûn derhal ji derve 18 milyar dolar hat, lê ev pere ne ji bo veberhênanên aboriyê lê bo faîza bilind hat şandin! Kêliya Erdogan bi referansa xwe ya îdeolojîk faîza ku "heram" dibîne daxîne jêr, ew pereyê amade dê tavilê ji dest biçe. Rewşa aboriyê tenê bi polîtîkayên diravî nayê sererastkirin. Sepandina faîza bilind û pereyê neqdî, dişibe muptelayekî ku bi morfînê demekî were razandin, tiştên em dibînin ev e.

Ji bo xelaskirina aboriyê piştî ku firotina rezervên BN û bilindkirina faîzê jî nebûn çareserî, dor hat ser zêr û diwîzên bi buhayê çend quruşan ku xelkê di malên xwe de bo rojên reş vedişart! Erdoğan bang kir, got: "Zêr û diwîzên di malan de serweta me ya netewî ye, bila bo amûrên fînansên curbecur ramedînin û bi vî awayî têkin nava ekonomiyê û îmalatê." Helbet muxatabê vê bangê ne esnafên biçûk, karker û bêkar in, lê yên ku bi kîloyan zêrên wan û deste bi deste dolarên wan hene, ew in. Fermo, bila ew li pêş bimeşin! lê, em dê bibînin ku piştî vê bangê ew dê bêtir zêran û diwîzan bikirin! Lewra niştimanê kapîtalîstan û patronên hebûna veguhestî û neveguhestî pere ye! Dirav li ku derê bin ew li wir in! Diruşma "welat, netew û Sekarya" tenê pûşiya ser çavên wan e!

Betalî, bi guhertina daneyên Sazi-ya Îstatîstîka Tirkîyê (bi Tirkî TÜÎK) nayê çareserkirin

TÜÎK, 303 hezar kesên ku hêviya xwe ji kardîtinê birîne mîna ku kar dîtibin daye nîşandan û derewa “bêkar 303 kes kêm bûne, tenê 4 milyon û 5 hezar kes mane... Rêjeya bêkaran 12. 9 ji % kêm bûye,” eşkere kiriye. Lê belê ew rastiya ku kesên bêkar kuçe û qadan dadigrin, derewa TÜÎKê derdixe holê! Di gel ku TÜÎK rêjeya betaliyê 12.9 ji % dide nîşandan jî, DÎSK-AR bi gelemperî rêjeya bêkariyê wekî 28.8 ji %, herwiha hejmara kesên betal jî 10 milyon û 382 hezar daxuyand. Bêkarî bûye mijarek wisa ku kapîtalîzm û desthilatdariya AKPê di bin vê arîşeya mezintirîn a civakê de êdî tengijiye!

Desthilatdarî her çiqas dibêje “min qedexeya jikaravêtinê dirêj kir” jî, ev yek ne rast e û nayê sepandin. Karbidest bi alîkariya “KOD: 29” karkeran bihevre an yeko yeko ji xebatê dûr dixe. Di vê “kodê” de wiha tê gotin: “Ji xeynî xelasbûna kar, kutabûna xebitîna cihê kar, xelasbûna dema destnîşankirî ya di hevpeymanên xizmetê an kar de, rewşên bêrewişt û yên li derveyî prensîbên niyeta baş...”

Pirsgrêkên civakî her diçe girantir dibin, êdî ne dema axaftinê ye!

Bi milyonan kesên bêkar ji bo li jiyanê bimînin divê bixebitin, lê mixabin kar tune ye! Jixwe di şertên desthilatdariya AKPê de ku polîtîkayan bo alîgirên xwe diçespîne kardîtin pir zehmet e! Kesekî betal gava kar bibîne jî, bi qezenca xwe nikare nan û xurekek têr û ehîl bibe malê! Bi Biryarnameyên di Hukmê Qanûnan de (KHK) bi deh hezaran karker û kedkar ji xebatê hatine dûrxistin, ew di tu cihekî din de nikarin bixebitin û bi vî awayî bûne wekî mehkûmê mirinê! Bi sedsalan jinên kedkar ji bo ku li hember mêran bigihîjin mafên wekheviyê tekoşîn didin, lê niha êdî nikarin bibin hêza keda erzan an şûngir jî. Kesên ku zanko diqedînin, bi mûçeya herî kêm jî nikarin kar bibînin. Esnafên biçûk bêsîfteh êvaran dikanên xwe digrin...

Li Amed, Dîlok, Wan û Rihayê, ango li seranserê Kurdistanê ev tablo girantir e. Ji du kesan yek betal e, ji 10 kesan 7 jê deyndar in. Lewra rejîma mêtingehkar, çavkaniyên welêt ji dêvla ku di qada hilberîn û kardîtinê de wekî veberhênan pêk bîne, bi mebesta ewlehiyê di çêkirina riyan û avakirina qereqol û zîndanên nuh de xerc dike! Ji bilî vê, karkerên demsalî tenê ji ber ku Kurd in li Trabzon, Yozgat, Sekaryayê û hwd... bajarên li rojava pêrgî êrîşên nijadperestan tên û ev yek her diçe zêde dibe.

Bi milyonan kesên bêkar, karker û xizan, nikarin pêdiviyên jiyanê bi dest bixin. Betaliya ku bûye penceşêra civakî, feqîrî û enflasyon her diçe pir dibin. Rêjeya kesên ku li malê xwarinê napijînin roj bi roj zêde dibe! Kesên bêkar, karker û xizanên li bajaran êdî nikarin nefesê bistînin! Rêjeya newekheviyê jî çiqas diçe bilind dibe, zengîn bêtir zengîn û xizan jî xizantir dibin!

Li aliyekî hejmara feqîran li aliyê din hejmara kesên milyarder zêde dibin. Vê tabloyê dibe sebebê pirsgrêk û travmayên giran ên civakî û ev rewş bi bêkaran, karkeran û bêmalan peyva "êdî bes e, kêr gihîşt hestî" dide gotin.

Di nirxên exlaqî û çandî yên civakê de jî, her diçe rûxandin bi pêş dikeve!

Ji aliyekî ve kesên ku nikarin xureka têr û ehîl bidestxînin, bi peyva "em birçî ne birçî!" dinalin û ber bi xwekuştinê diçin... Li aliyê din kesên ku di dema girtinê de li ber derê bazarên taxê li benda fêkî û zêrzewatên xerabûyî ne, an jî kesên li cihên qirş û qalan li xwarinê digerin ku bi vê arîşeyê û fediyê dijîn... Hemwelatiyên ku "zeytê bi sitekanan, ava firengiya bi kevçiyan" dikirin... Kesên ku êvarê birçî radizên... Bêmalên ku li kuçeyan dimînin... Bavên ku karker in jî nikaribin xerc û mesrefên perwerdeya zarokên xwe dabîn bikin... Û karkerên ku bi diruşma "em bi vê mûçeyê nikarin debara malê bikin" dimeşin.. Hin karker xwe dikujin... Ew ne tenê ji aliyê aborî herwiha ji aliyê manewiyatê ve jî dirûxin. Niha erozyonek di nirxên rewştî yên civakî de heye û rizandinek çandî bi arîşeyên civakî û aborî re tê jiyîn. Hejmara kesên ji civakê dûr dikevin pir dibe.

Devlet li cihê ku mûçeyek ehîl an karekî ku jiyaneka bi rûmet bisepîne û mafên civakî bo karkeran dabîn bike, bi navê "alîkariya civakî" xelkê "ne dikuje ne dihêle"! Bi afirîna çanda parsekiyê rûxandina darayî û manewî bi pêş dixe!

Desthilatdarî, dixwest ser vê tabloyê bi propagandaya Lîbya, "niştimanê şîn", "mizgîniya xaza li Deryaya Reş", Şerê Qerebaxê û bi lêgerîna "serkeftina" li Herêma Kurdistanê û Rojavaya Xweser binixumîne. Lê belê xwesteka wan neçû serî. Dijraberî vê, siyaseta cengê ya ku disepandin, qeyrana aborî kûrtir kir, arîşeyên civakî girantir kir. Ango nikaribûn rojeva rasteqîne ya karker û xizanan biguherînin. Nikaribûn belavbûn û pişivîna girseya AKPê bisekinînin! Kîjan demê Erdogan derkeve kuçeyê, pêrgî feryadên "ez betal im, birçî me!" rû bi rû dibe. Lewra rojeva rasteqîne ya bêkaran, karkeran, feqîran, derfetên xebatê, rêjeya enflasyonê û barana zeman e!...

Kapîtalîzm nikare pirsgrêkan çareser bike û nikare barên civakê hilgire!

Di rapora Forma Davosê ya Aboriya Dinê de ku di sala 2021an de pêk hat wiha tê gotin: "Her roj 700 milyon mirov birçî radizên. Di sala 2020î de 100 milyon kes li girseya feqîrên belengaz zêde bûn û tê çaverêkirin ku ev hejmar di dawiya 2021ê de 150 milyonên din dê pirtir bibe. Di Dinê de 2 milyar mirov nikare xwe bigihîne çavkaniyên ehîl û ewle yên xurekê." Di sala 2020î de 152 milyon zarok hatine xebitandin, 73 milyonên vê girseyê di karê xeter de dişuxulîn. Cih û malên milyarek û 200 milyon kesan bo jiyanê

ne guncaw in, 100 milyonên ji vê girseyê bêmal in! Ne hewce ye em qala sed milyar kesên betal bikin!

Hin xalên sereke ji “Rapora Xetereya Gerdûnî” ya ku di sala 2021ê de bi hevkariya Zurîh Sîgorta, Marsh Tirkiye û TÜSİADê (Komeleya Karsaz û Pîşekarên Tirkiyê) hatiye nivisîn ev in: “Newekhevî her diçe pirtir dibe... Xizanî zêde dibe... Pandemiyê rêjeya feqîriyê û newekheviyê bilind kir. Qeyrana bêkariyê û debarê roj bi roj kûrtir dibe.... Nehevsengî pir belav bû, Asta parçebûna civakî dê bilind bibe... Birêvebirina xebata ji dûr ve di hemî sektoran de belav bûye... Miradê ciwanan di ber wan de maye...” Vê lîsteya arîşeyan ji bo afirînerên esasî yên qeyrana aborî û rûxandina civakî mukurhatinek e, dibêjin “êdî em nikarin birêve bibin!”

Burjuvazî, qeyraneka aboriyê mîna ya sala 1929an ku bibû sedemê Cenga Duemîn a Dinê li pêş xwe dibîne û ditirse. Lewra îro jî “reqema mezinbûnê ya sermayeyê bi ser rêjeya 2 ji % nakeve, her wisa maye. Ji bo ku vê rewşê çareser bikin ji mêjve ye ew di civînên asta bilind de (mîna Davosê û hwd.) vê mijarê niqaş dikin. Tewereya van guftûgoyan bi rêjeya mezinbûnê ve girêdayî ye. Niqaşan pêk tînin û biryaran distînin, lê belê nikarin geşedana mezinbûne biafirînin!” Fermo, li qeyrana bêçare ya rêvebirinê binêrin! Wate ew e ku burjuvazî jî êdî ji pêşeroja kapîtalîzmê bêhêvî ye! Tirsa wan a ku sazûmana xwe bêqeza û bela bidomînin, her diçe zêde dibe.

Werin; dem dema geşedana tekoşîna bo azadîyê, xebatê û xurekê ye! Haydê em bi hevre têbikoşin!

*Burjuvazî û berdevkên wan ku bi xwe xetereyan diafirînin, dibêjin “ha xetere û ha xetereya gerdûnî!” Kevir bi serê we de bibare! Hindik ma sîstema we ya kedxwar birûxînin! Kî? Kesên ku her şev birçî radizên, ên ku xwe nagihînin xurekên ehîl û têr, mirovên betal û bêmal, ango yên belengaz û tazî! Burjuvazî dê sîleyeka ku misteheq e ji karker û xebatkaran bixwe.

*Berpirsê vê tabloyê kapîtalîzm û desthilatdariya siyasî ye. Li dijî vê yekê ji xeynî rêkxistinbûnê, pêşxistina tekoşîna bo nan, kar û azadiyê tu rê tune ye. Ya em dê di nava çerxên kapîtalîzmê de bipelçiqin, an jî em dê li dijî sazûmana kedxwar û mêtingehkar a ku birçîtiyê, xizaniyê û betaliyê diafirîne bi hevkarî têbikoşin û jiyaneka mirovane damezrînin.

*Bila kapîtalîst û nûnerên wan ên siyasî bizanibin ku, heke ji me re kar, xurek û azadî tune be, dê aramiya sazûmana kedxwar a kapîtalîzmê û ya kuçeyê jî tune be! Raperîna karkeran, bêkaran û xizanan a li dijî kapîtalîzmê, bi qasî ku mafekî demokratîk e herwiha pêwîstiyeke jiyanê û sekna li ser piyan e jî. Di vê rewşê de, di hebûnê de tunebûnî û herwiha ji yên ku me layiqî birçîtiyê dibînin, ji sazûmana kapîtalîst ya ku bi peyva “xebat tiştekî pîroz e” milyon kesan bêkar dihêle re em bibêjin NA!

***Werin em bi hev re bêjin:**

“Xebat, xebat, xebat, 6 saet xebat, ji herkesî re kar!”

Em biqîrin û bang bikin: “Bila herkes 6 saetan bixebitin, kesek bila bêkar nemîne!”

Dem dema qêrîna vê diruşmê ye! Lewra bi derketina Koronayê re li ser sed milyonan betalên li Dinê, bi deh milyonan betalên nuh zêde bûn û ev yek her diçe mayînde dibe. Riya çareseriya arîşeya bêkariyê ev e ku; di pêvajoya hilberînê de di dewsa xebitîna karkeran de, xebitandina Mêjiyê Çêkirî ango robotan e. Bi vî awayî dema mesaîyê divê dakeve 6 saetan, dû re 4 û gav bi gav bikeve heta 2 saetan! Trenda dîrokî, li me ferz dike ku di hilberînê de astengiyên li pêşiya robotan werin rakirin. Di gel ku burjuvazî jî vê yekê dixwaze, lê nake. Lewra geşepêdana otomasyona tevayî ya li ser pişta robotan, ya dê wan mecbûr bike ku bêyî sed milyonan bêkar bixebitînin mûçeyan bidin, an jî bêyî daxistina yewmiyeyên karkeran saetên xebatê kem bikin. Burjuvazî ji ber berjewendiyên xweparêz, her du xalan jî bi cih nayne, nikare bîne. Ji bo ku ew bibin mezaxur, bêyî ku betalan bixebitînin ew nikarin mûçeyan bidin. Heke karibin bidin, jixwe dê pirsgrêkê çareser bikin! Lê vê carê wateya kapîtalîstiya wan namîne, lewra sazûmana kedxwar a kapîtalîst ku li ser bingeha qezencê ye dê bi dawî bibe. Li vir jî, rewşa kapîtalîzmê ya ku di nava dêrê û mizgeftê de asê dimîne tê dîtin. Belkî were gotin ku, di van şertan de kesekî bêkar qebûl dike ku rojê 10 saetan an 16 saetan bi mûçeya herî kêm bixebite! Lê belê, di van mercan de, ji bo hemî kesên bêkar derfetên xebatê bibînin, divê em angaşta “bila dema xebatê 6 saet be!” biparêzin.

*Di asta gerdûnî de, kuçe û kargeh dikevin nava liv û tevgerê. Helbet dê bilivin. Qeyrana ku kûr dibe, radîkalîzma çep û rast dê bi hêz bike. Komunîst, bi armanca alternatîfa sosyalîzmê divê bi lez û bez xwe ji pêvajoya nuh re amade bikin. An na xiringêle li ber derî ye! Çareserî, di pêşxistina mixalefeta şoreşger a rêkxistinkirî de ye...

Hayde, werin tekoşîna birêkxistinî!

Bimre sazûmana kedxur a kapîtalîst!